Di sala 1974an de Mihemed Şêxo li bajarê "Sersingê" dijiya, û di wê çaxê de têkiliyên wî bi hunermendên navdar re mîna "Mihemed Arifê Cizîrî-Îsa Berwrî - Tehsîn Taha" çêbûn.

Gava agirê şoreşa Eylûlê geş bû, Mihemed Şêxo xwe tevlî rêzên tevgera kurdî kir, û bi pêşmergeyan re xebat kir.

Piştî peymana(Cezayir)û têkçûna şoreşa kurdî, bi pêşmergan re, derbas bû Kurdistana Îranê..di kampa penaberan de, ya bajarokê (Rebetê) de, bi cîwar bû, di pê re Li(Mehabad) ê. Li wir zimanê Farisî xwend û diploma wê wergirt, û pêwendî bi (Mistefa Artûşî û Xelef Zîbarî) re çêkir.

Di 1977 - 1978an de, Kasêta xwe " Mehabad Kaniya Xwîna Şehîdan " tomar kir. Lewre desthilata Îranî Mihemed Şêxo şopand, û ew û gelek malbatên Kurd surgon kirin parêzgeha (Ostanê Mazenderan) nêzîkî derya Qezwînê, û li wir Mihemed Şêxo di dibistanekê de bû mamostayê ola islamî

Wî Nisrîn Hisên Melekê di wê dibistanê de ku rêza nehan dixwend nas kir, û ji xwe re anî. Jê re" Felek 1979- Ibrahîm 1980 - Birûsk 1982" anîn.

Di sala 1983an de vegerîya, û li bajarê Qamişlo bicîwar bû..

Di sala 1987 an de, tomargehek bi navê "Felek" vekir, lê desthilata Sûrî nehişt ku salekê berdewam bike, girtin û alavên tê de tev de birin. Piştî 5 salan û piştî ku koçkirina wî vegerandin.

bêtirî 110 stiranan di 14 kasêtan detomar kirîye, û stran tê de dûbare nabin.

Di despêka Avdar 1989an de bi xuşka xwe ya nexweş re çûbû Şamê, li wir bavê Felek êşiya. Piştî vegeriyan Qamişlo, di 4ê Avdarê de li mal gelkî êşiya, textor Ebdulmecîd ji ber rewşa wî a xerab ew rakir nexweşxana dewletê. Pişt re vegerandin mala wî û dîsan nexweşiyê lê zor kir.

Di roja 9ê Avdarê demjimêr 5ê sibehê, Bavê Felek çavên xwe li jiyanê girt, û hesreta 40 salî ji bo dîtina Kurdistanek azad û serbixwebi xwe re bir gorinê.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Kurd Û Siyaset

Tê xwestin ku li kîjan devera Kurdistanê biserketin hebin divîbû ew aliyên din jê re alîkar bin, çawa rola Pêşmergan li Kobnî pîroz bû û rola YPG ê li Şingalê pîroz bû divê şandeke Kurdî ji bo gufûgoyên li ser Sûriyê çê dibe ku ev şand nûnertiya miletê me bike hebe û baweriya gel bi pêşengiya wî vegere.

Mihemed Şêxo

Her milet li gor karîn û derfetên xwe rê û şivîlan bo çareserkirina bobelatên xwe peyda dike, yan di çarçoveya hemdema xwe de lêgerîneke balkêş dike amanca xwe da bighêje devera daxwazkirî.

Miletê Kurd jî siyaset ketiye hestiyên wî de yan ev tişt bûye dax li ser aniya wî nivîsiye, heme ku yek bibêje ez Kurd im di cî de Tirk, Faris û Ereboşk wî bi tawana heyîna wî gunehbar dikin û dibêjin niha wê ew doza mafê xwe bike …û dibêjin xwezî Kurd nebane!!!

Piştî hilweşandina Imbratoriya Mîdya miletê Kurd her dem xwe parçekirî dîtiye, wek mîrnişîn, êl û ol û bi her awayî hewl daye xwe ji bin xiniza dagîrkeran rizgar bike lê berjewendiyên van dijminan her dem ew bû ku Kurd tarûmar bimînin, wan hemî rikberî û nakokiyên xwe didan pişt xwe û pir dek û dolab tanîn serê milatê me yê bêxwedî, ma em ê civînên çarqolî navbera Tirkî, Iraq, Iran û Sûrî de jibîr bikin!!! Gelek şoreşên me li Bakur û Başûr hatin pengizandin lê her dem ji bo egera olî yan ya êlî ta demekê dihate vemirandin ta komarên mezin ku siyaseta cîhanê dinexişînin rehên xwe berdan herêmê bi taybet Kurdistan, û dîse li gor berjewendiyên xwe rojên reş yan hin çirûskên azadiyê bi ser welêt de dihatin berdan mîna Komara Mehabad û şoreşa Berzanî.

Nifşên nû ji bizava rizgarîxwaz bi şêweyê kar ne razî ne, lê hîna biryar di destê nifşên damezrêner de ye ji ber gelek sedeman:

Hin ji kesên destpêkê bi felsefe û aydyolociyeke Markisî gelek kes li dor nerînên xwe civandine, lê ev tewer hate parçekirin û bû çîvar çîvar ji ber surişta civakê, fişarên dagîrkeran, û di dawî de van xwe di nav nerîna netewî de pişaftin.

Hin in dî bi rastgoyeke belî berê xwe dane armancê di riya dîmokrasî û hestê netewî re û pir qizinc bidest xistin ji aliyê cemawerî û netewî ve, lê ji ber destwerdana neyaran û neyekrêziya rêxistin û hêzan biryarên qels dihatin standin, çawa hin destên xwe tavêjin Sûrî û Iranê û hinin dî jî berê wan li Tirkî û Europa ye!!

Di navbera van her du feraşan de milet hate hêrandin, çol û beyaban jî bi dest gelekan nakeve ku xwe lê bigrin, namaze ku Daîş qirêjiya nerînên xwe yên reş verîşandiye û fermana heftê û çaran hate serê miletê me yê Êzîdî li Şingala birîndar.

Tê xwestin ku li kîjan devera Kurdistanê biserketin hebin divîbû ew aliyên din jê re alîkar bin, çawa rola Pêşmergan li Kobnî pîroz bû û rola YPG ê li Şingalê pîroz bû divê şandeke Kurdî ji bo gufûgoyên li ser Sûriyê çê dibe ku ev şand nûnertiya miletê me bike hebe û baweriya gel bi pêşengiya wî vegere.

Cinêva Sûrî Yan Jî Ya Swêsrî ?!

"Mixabin Cinêva 4an jî wek ê berê, wê mirî be, berî ku lidar bikeve, û Cinêv wê dîsan bimîne bajarekî Swîsrî ji tewrîsma mêhvanan re, wê bixwin, vexwin, razin, û çend caran ji xwe re derkevin ser alavên ragihandinê, û Cinêv dîsan nabe cihê çareserî û bidawîanîna êş û xemgîniya Sûriyan"

Dilovan Silow

Cinêv bajarekî Swêsrî pir xweş e, wek tê gotin, lê navê vî bajarê Ewropî di çend salên dawî de bi kirîza Sûriyê ve hatiya girêdan, û wek tê zanîn ku Cinêva bi hijmara 4 wê di meha Sibata 2017an de li dar bikeve, wek her sê carê berî wê, tevahiya Sûriyan bi hêvî ne ku encamine erênî bi xwe re bîne û dawî li vê tiracêdiyayê were. Lê mixabin ev bû 6 sal ku cihê hêviyan di dilê sûriyan de pir biçuk maye, sedema sereke jî ewe ku hêzên siyasî yê ku xwe dikin berdevkê fermî ji miletê Sûrî re nikarîbûn mafê vî miletî di jiyanke bi rûmet bi dest bixin, ev jî tê wê wateyê ku ev alî û keseyatên han ne nûnerên rasteqîne ne ji vî miletî re, li gor vê rastiyê tê xuyakirin ku kesê nûnertiya vî miletî bikin ew in kesê ku ev milet parastine û ta ku ji wan hat ziyan û şer dûrî wan xistin, bê ku ji tu aliyan re bibin kole, ku em werin herêmin kurdî li Rojavayê Kurdistanê wê her kesê bizane ku Hêzên Sûrya Demoqrat, yên ku bi navê QSD têne naskirin, û bi taybet hêzên YPG û YPJ ew bûn hêzên ku karîbûn parastina xak û sivîlan bikin û gelek herêmin di bin destê Da'aş ê de rizgar bikin, tevlî ku ev hêzên leşkerî di hemû helkeftan de radighênin ku nûnerê wan ê siyasî jî hene, û ew in rêveberiyên Xwesera Demuqrat di her sê kantonan de Cizîr , Koban, û Efrînê, bê ku em jibîr bikin ku bêhtirê hêzên leşkerî yên bergiriya Sûrî yê ti aliyan nabînin wek nûnerên siyasî ji xwe re, lê tevî van hemû rastiyan kesê ku civînên Cinêv bi rê ve dibin ti vexwndinan ji van hêzên resen ê milet re naşînin, ev jî tê wê wateyê ku hêzên navnetewî hîn negihane ti biryaran ku pirsgirêka Sûrî çareser bikin, loma kesê xwedî hêz û biryar li ser zemînê nayêne vexwendin, jiber vê yekê wê dîsa bêhtirê miletê Sûrî destê xwe bide ber rûyê xwe û wê hêviyên xwe yên şikestî bihêle li benda demeke dî, demeke ku ti alî newin pişt-guhikirin wek çilo di dema rêjîmê de çêdibû.

Mixabin Cinêva 4an jî wek ê berê, wê mirî be, berî ku lidar bikeve, û Cinêv wê dîsan bimîne bajarekî Swîsrî ji tewrîsma mêhvanan re, wê bixwin, vexwin, razin, û çend caran ji xwe re derkevin ser alavên ragihandinê, û Cinêv dîsan nabe cihê çareserî û bidawîanîna êş û xemgîniya Sûriyan.

Dengê melodîk ê Şîfa Gerdî jî çû

Mirov gelekî li ber mirina stêrên ragihandinê, nivîskar û hunermendên ku mirov ji wan hez dike dikeve. Lê belê dema ew kes nas bin, xemgîniyeke mezintir e.

Li ser kar bûm û çend deqiqeyek bû ku min li ser malperên cuda nûçeyên dawî xwendibûn. Bi hatina peyamekî min li telefona xwe nêrî. Hevalekî bi smilyeke xemgîn lînka Al Jezeera ya ku agahdariya wefata Şîfa Gerdî tê de bû rêkiribû. Ya rast behitîm lê dibe ji ber hefteya karnevalê ya li Almanyayê, fikirîm ku henekeke tehl a ji çend mehan bi hev re perwerde dît. Bi azmûn bû. Di perwerdeyê de yekem weşana zindî ya navxweyî wê bi awayekî gelekî serkeftî pêk anîbû. Miroveke gelekî giran bû. Heta tu bibêjî ji xwe bawer bû. Di nava civakeke konservatîf û sêncên hesasiyetên çêkirî yên civakî de mezin bûbû. Lê xwe di ser wan sêncan re qewastibû. Xwe bi vî awayî dabû qebûlkirin. Herdem vê jixwebaweriya wê bala min kişandibû.

Li Başûr karkirina jinan di televîzyonan de ne karekî

Zekî OZMEN / QAD

guhertîtir bû. Nezewicîbû. Xwe bi malbat û civakê dabû qebûlkirin. Di temenê xwe yê ciwan de bûbû xwedî kariyer. Bi karê xwe radibû û bi karê xwe rûdinişt.

Mirina Şîfa divê ji televîzyonên Başûr re bibe ders. Reqabeta ka kîjan peyamnêr bêtir dikare xwe bavêje metirsiyê divê ji holê rabe. Ewlekariya rojnamegeran divê di ser nûçe û dîmenên werin ragihandin re be.

Di dawiya de vê bibêjim; Min çend caran ji Şîfa re gotibû dengê te wekî molodiyê ye û pêwîst nake tu di dema nûçexwendinê de zehmetiyê bidî qirika xwe. Her cara min ev yek jê re digot gelek kêfa wê dihat. Min ji dilê xwe digot û ew jî ji dilê xwe dikeniya. Lê mixabin ew dengê wekî melodiyê çû. Bila serê malbata wê û hemû dost û hevalan sax be.

Jêder: Diyarname

hedê xwe derbasbûyî be. Min di nava behitandinê de yekser jê re nivîsî kuro ev çi henek e?

Got mixabin rast e.

Bi vekirina malpera Rûdawê re çav bi nûçeya bi wêneyê nivîsa "Bilez" ketim...

Min Şîfa di dema amadekariyên vekirina Rûdawê de nas kiribû. Me hesan e. Bi sedan kelem ji vê yekê re hene. Malbat rê nadin ku jin li ser ekranan derkevin. Civak bi çavekî xirab li wan dinêre. Ji ber vê yekê gelek jinên di televîzyonan de kar dikin bi pirsgirêkên malbatî re rû bi rû dimînin. Gelek jê ji ber van egeran ji aliyê hevjînê xwe ve têne berdan. Şîfa ji van hemûyan profîleke

Civînên Navnetewî Bê Yekîtiya Partiyên Kurdan Di xizmeta Dewletan De Ne

Bêgoman dibe ku Kurd di vê qonaxê de hindek mafan bi dest bixin, lê wek serxwebûn, bilindkirina alê bi navê dewletbûnê dê xewn be. Li ser ku merc û derfetên zêrîn hene di vê serdemê de û Kurd bi navê xwe beşdarî Civînên navnetewî bibin, lê berjwendiyên partîtî û neserxwebûna wan, vê qonaxa zêrîn ji destê miletê Kurd direvînin.

Demhat Dêrkî

Ev rastiyeke; di dîroka miletê Kurd de " çi berî zayînê, çi piştî zayînê) Kurdan tucarî di warê leşkerî de wenda nekiriye. Eger bi hûr û kûr û bi şêwazeke diyalektîk û di çarçoveya zanista siyasî de duh û îro bi hev ve bê girêdan û şîrovekirin, wê xuya bibe ku Kurdan berdewam di siyasetê de wenda kirine.

Îro ev rewş xwe dubare dike. Li Rojavayê Kurdistanê, artêşeke xwe bi hêz heye (YPG û YPJ) bi dehan destanên serkeftinê nivîsîne. Li Başurê Kurdistanê Pêşmergê Rojava hene ku di şerê li dijî rêxistina terorîst a Daîş'ê de bûne xwedî ezmûn, lê di warê siyasî de ku çarenûsa miletê Kurd bînin ziman di bin yek banî de, nînin.

Pir dengî heye, parastina kursiyan, parastina partiyan, ne li gorî berjwendiya Rojavayê Kurdistanê tevger heye, ev yek jî di riya pêkanîna çarenûsa miletê Kurd de xala herî lewaz e. Bi navekî din ev têkçûn e.

Bêgoman dibe ku Kurd di vê qonaxê de hindek mafan bi dest bixin, lê wek serxwebûn, bilindkirina alê bi navê dewletbûnê dê xewn be. Li ser ku merc û derfetên zêrîn hene di vê serdemê de û Kurd bi navê xwe beşdarî Civînên navnetewî bibin, lê berjwendiyên partîtî û neserxwebûna wan, vê qonaxa zêrîn ji destê miletê Kurd direvînin.

Divê were dîtin û were gotin, dewletên weke Amerîka, Rûsiya, Tirkiyê, Îran û rêjîma Suriyê biryara werdigirin ne ku partiyên Kurdan. Anko Kurd hêj nebûne xwedî siyaset ku nûnertiya xwe bikin. Ev dewletên navborî jî, mifayê ji neyekbûna partiyên Kurdan dibînin û li gorî berjwendiyên xwe, hespê xwe li Suriyê didin bezandin.

Lewma jî, dema Civînên navnetewî (civînên Cinêf hwd.) têne lidarxistin, Kurd weke Kurd nayêne vexwestin û beşdarkirin. Kesên beşdar jî dibin di bin baskên dewleta Tirk, Rûsiya, Sûriya û Amerîka de ne. Çima? Ji ber ku PYD û PDKS'ê, TEV-DEM û ENKES'ê ji bo çarenivîsa Kurdên Rojava ne yek helewêst û armanc in ji bo civînên navnetewî ji bilî tawanberkirina hev bi xiyanetê. Her partiyek xwe û berjwendiyên xwe diparêze. Mixabin, rastî tehl e, lê rewş ev e û heta ev yek berdewam bike, em tucarî nikarin behsa berjewendiyên miletê Kurd di civînên navnetewî de bikin.

Gelo çare çi ye û divê çi bêkirin ku êdî Civînên weke Qesra Şîrîn, Lozan, Cinêf û hwd, li şûna parçekirin û berjewendiya ji xelkê re, êdî bibin û bikevin di bin berjewndiya miletê Kurd de?

1- Hûrbûn û kûrbûn di dîroka miletê Kurd de û bi şêwazek felsefî û zanista siyasî bi destxistina encamên rast di warê têkçûnên siyasî de.

2- Yekbûna partiyan di bin yek armancê de, ew jî çarenûsa miletê Kurd e.

3- Raman û rêxistin û armancên partiyan çi dibe bila bibe, lê ji bo civînên navnetewî pêdiviya Kurdan weke nan û av bi yek dengiyê heye.

4- Di vê qonaxa zirav û hestyar de, divê ragihandina Kurdî bi neyînî hev du reş nekin li nava qada navnetewî de ku dibe astengek li pêşîgirtina wan di beşdarbûna civînên navnetewî de.

5- Bêgoman di rewşa îro ya Rojhilata Navîn û Sûriyê de, hêza leşkerî roleke xwe ya sereke heye. Lê, eger zimanê siyasî, zimanê dîplomasî yên yekgirtî nebin, dê weke her car kar û xebata Kurdan bikeve bin xizmeta dewletan de.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Mele Mistefa Barzanî (Jiyan û Dîrok) (1903 - 1979)

Serkirdeyê kurd Mele Mistefa Barzanî di 14ê Adara 1903an de ji dayik bûye. Di 3 saliya xwe de dagirker û dagirkerî nas kiriye. Piştî şikestina serhildana Şêx Ebdulselam Barzanî, di sala 1907an de Barzanîyê 3 salî jî bi dayika xwe re li girtîgeha Mûsilê tê girtin.

Di sala 1915an de jî gava Şêx Ebdulselam Barzanî li bajarê Mûsilê ji aliyê Waliyê Osmanî Silêman Nazîf Paşa - ku ew jî bi eslê xwe Kurd e- ve tê darvekirin, Barzanî wê çaxê 12 salî ye, û li wê meydana darvekirinê amade ye.

Li gor hin çavkaniyan di sala 1919an de Şêx Ehmed ji bo kar û barê serhildanekê birayê xwe yê 16 salî Mistefa Barzanî dişîne Bakurê Kurdistanê. Barzanî di wî temenê xwe yê ciwan de, li bajarê Mûşê hevdîtinekê bi Şêx Evdilqadirê Nehrî û Şêx Se'îdê Pîran re dike. Li ser daxwaza Xoybûnê Mistefa Barzanî bi 500 pêşmergên xwe diçe hewara serhildana Agiriyê û li Herêma Oramarê li dijî leşkerên Romê şer dike. Û piştre derbasî herêma Barzan dibe. Di hemen salan de, li başûrê welêt leşkerên Iraqê bi alîkariya balafirên Îngilîzan êrîş birin ser herêma Barzan. Piştî berxwedaneke dijwar tevgera Kurd carek din jî bi îxanet û piştgiriya hin eşîrên Kurd têk diçe.

Di sala 1932an de Mistefa Barzanî, Ehmed û Sadiq Barzanî bi pêşmergê xwe ve mecbûr man ku derbasî bakur bibin ku li wir jî ketin bin destê dewleta Tirk. Piştî ku di sala 1934an de li Iraqê efûyek derket malbata Barzanî û penaberên Kurd vegeriyan Başûr. Lê her sê Barzanî ji malbata xwe hatin veqetandin û berê wan dan çoleke Ereban ya bi navê Hîlleyê. Li ber daxwaza dijmin hustuxwarkirin û ji fermanên wan re teslîm bûn ne li gora Barzanî bû.

Barzanî vegeriya Kurdistanê û Rewandiz ji dijmin rizgar kir. Piştî ku leşkerên dijmin bi hêzeke mezin êrîşî Rewandizê kirin, Barzanî careke din berê xwe da dostê xwe, çiyayên Kurdistanê. Barzanî piştre bi rêvebiriya Iraqê re li hev kir û hat li Silêmaniyê bi cî bû.

Di sala 1943an de li Colemêrgê serhildana Se'îd Birokî destpê dike. Barzanî dîsa helwest û nasnameya xwe ya Kurdistanî eşkere kir û bi pêşmergên xwe re çû alîkariya serhildana li bakurê welatê xwe. Di wan salan de Barzanî geh ji bo alîkariya rojhilatê welêt bi leşkerên Îranê re, geh jî bi leşkerên Ereb re her di nava şer de bû.

Têkoşîna di salên 1943-1945an de bi alîkariya Îngilîz û Tirkan têk çû û Barzanî bi malbata xwe re derbasî rojhilatê welêt bû.

Di sala 1945an de bi beşdariya Barzanî li rojhilat "Partiya Demokrata Kurdistan-Îran" hat avakirin. Di meha Çileyê Paşîn ya sala 1946an de li Mehabadê Komara Kurdistan hat eşkerekirin. Barzanî bi du kesên din re ji aliyê hikûmetê ve weke ceneral hat hilbijartin.

Di sala 1946an de gava Barzanî li Mehabadê bû "Partiya Demokrata Kurdistan-Iraq" hat damezirandin. Ligel ku Barzanî di kongreyê de ne amade bû jî, ew wek serokê partiyê hat hilbijartin. Piştî têkçûna Komara Kurdistan li Mehabadê, Barzanî alaya Kurdistanê ji Serokkomarê Kurdistanê Qazî Mihemed wergirt û bi 500 leşkerên xwe dest bi meşa xwe ya dirêj kir ku li Sovyetê bi dawî bû. Li ser wê riya dirêj ya ku bi qasî 350 kîlometir bû, bi leşkerên Îranê û Tirkiyê re şerê dijwar kirin û bê ku zirarekeke mezin bibînin ew di ser Agirî re, 18ê Hezîranê gihîştin cîhê xwe.
Ew meşa ku di dîrokê de bi navê "Meşa Dirêj " cî girt,, 52 rojan ajot.

Bi mirina Stalîn û bi hatina Krusçev re bi hewldana Barzanî rewşa wan ya li wir çêtir dibe, pêwendiyên Barzaniyê nemir û Sovyetê dikevin pêvajoyeke nû. Hin mafên Kurdan yên ku Stalîn dest danîbû ser, li wan tê vegerandin.
Di 14ê Tîrmeha sala 1958an de, bi darbeyekê Ceneral Ebdulkerîm Qasim desthilatiya Iraqê xist destê xwe. Ceneral Qasim di çarçoveya Iraqê de, hin mafên Kurdan nas kirin û bangî Barzanî kir ku vegere welatê xwe.

Barzanî di 6ê Çiriya Paşîna 1958an de vegeriya Bexdayê. Li balafirgehê bi sedhezaran kesan pêşwaziya wî kirin. Barzanî bi Qasim re hevdîtinek kir û bi lihevkirina ku ev guftûgo bidomin vegeriya Kurdistanê.

Lê wê " Buharê "jî li Kurdistanê zêde dom nekir. Qasim, hemû sozên xwe binpê kirin û di sala 1961an de, bi leşker û balafirên xwe êrîş bir ser Kurdistanê. Barzanî careke din bi 400 pêşmergeyan ve berê xwe da serê çiyayên Kurdistanê.

Di sala 1963an de li Iraqê derbe çêbû û desthilatî vê carê ket destê Baasiyan de. Di sala 1970î de Sedam Hisên çû Kurdistanê û sê rojan li gel Barzanî ma û peymanek îmze kirin. Peymana ku xweseriya Kurdistanê qebûl dike



di 11ê Adara sala 1970î de di radyoyê de ji aliyê Hesen El Bekir ve hat xwendin.
Di van salan de jî ew li ser gotinên xwe neman. Sedam bi melayekî re, bê ku haya wî jê hebe di wan salên lihevhatinê de, Quraneke bi bombe dişîne ji Mistefa Barzanî re. Lê Quran di destê mela bi xwe de diteqe û pêşmergeyek jî bi wî re şehîd dikeve..

Di nav van pirsgirêkan de di 11ê Adara sala 1974an de hikûmeta Iraqê, bê destûra Barzanî xweserî eşkere kir. Bi vî awayî xwestin Barzanî û PDK-Iraqê bê bandor bikin û raya giştî ya Kurdan û dinyayê bixapînin ku qaşo li Kurdistanê xweserî heye. ew her xwediyê yek peyvê bû, li derekê peyvek li dereke din gotineke din nedikir. Di heman demê de ji rojnamevanê Misrî Hasaneyn el Heykel re wiha digot: " Şoreşa Kurd bi dawî nehatiye. Niha tenê navber daye û bîhna xwe vedike. Rola min bi dawî hatiye, lê gelê Kurd li cihê xwe ye û dikare serokên ku berxwedanê bi rê ve bibin ji nav xwe derxe. Rola min temam bûye, lê ne mimkun e ku dawiya gelê Kurd were ".

Di sala 1976an de Barzaniyê nemir ji bo dermankirina nexweşiya xwe bi daxwaza malbat û partiyê çû Amerîkayê. Lê ew Barzanî ye û li wir jî vala rûnane û her têkoşîna xwe didomîne.

Piştî ku rejîma Iraqê gîhişt wê encamê ku bi şer nikare Kurdan têk bibe. Bi alîkariya Sovyetê pirsa xwe ya bi Îranê re bir Konseya Ewlekariya RNY. Di encamê de bi alîkariya Amerîkayê "Peymana Cezayirê" hat îmzekirin û tekoşîna gelê Kurd bi "dîplomasiya mezin "hat firotin. Du nameyên Barzanî ji bo Nikson û Kissenger bê bersiv man…

Piştî ku hemû hewldanên wî yên bi Îranê û Iraqê re jî bê encam man, ew bi 200 hezar kesî re derbasî Îranê bû û dawî li Şerê çekdarî anî…

Çi li serê çiyayên Kurdistanê û çi li paytextên dagirkeran Li Amerîkayê ji Jimm Carter re vê nameyê dinivîse:

((Birêz Serokkomar, em ne li dijî lihevhatina Îran û Iraqê bûn. Lê gelo pêwîst bû ku Kurd bibûna qurbanên vê lihevhatinê? Me Kurdan bi soz û bextê Amerîka ya Yekbûyî û Îranê bawer kir û li dijî cûntaya Iraqê şer kir. Ew soz û bextê ku ji bo azadiyê hatibû dayîn li ku derê ma? Li kampên Îranê yên penaberiyê? Li Başûrê Iraqê ku Kurd hatin nefikirin? Di belavbûna Kurdan ya li Rojhilatê? Bi perçekirin û belavkirina malbatan, jin û zarokan? Di bin îşkenceyên mirinê de? Neteweyê DYAê ku jibo hemû gelan şayanî serfiraziyê ye û bingehê yekîtî, azadî û demokrasiyê avêtiye, dikare piştî vê rola ku di têkçûna azadiya Kurdan de leyistiyê bê însîyatîf bimîne?"))

Mele Mistefa Barzanî di 1ê Adara sala 1979an de li Washingtonê li nexweşxaneya George-Town Hospital çû ser dilovaniya xwe.. Ew li Kurdistana rojhilat ji aliyê bi sedhezaran kesa ven hat pêşwazîkirin ..Piştî ku Sedam Hisên kete Kiwêtê de, û Emrîka ew ji Kiwêtê derxist Kurdan jî destê xwe danîn li ser Başûrê Kurdistan, û di sala 1991ê de gora Barzanî veguhestin herêma azad, û li gundê Barzan sipartin axê...

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Zewaca Zarokan Ne Qeder e

Zewincandina zarokan ya di temenê biçûk de, li Kurdistana Bakur pisgirêka civakî ya herî sereke ye. Li gorî rapora Lêkolina Saziyan û Statîskên Tirkiyê (TUİK) ya fermî de li Tirkiyeyê û Kurdistanê herî kêm 181 hezar bûkên biçûk hene û bi tenduristiya derûniyê re rû bi rû ne. Psîkolog destnîşan dikin ku her çiqas ev zewac di nava civakê de wî ji rêzê were dîtin jî, di esesa xwe de ev îstismarekî zayendî ye"

Psîklog Ozlem Tolan têkildarî zewicindina zarokên biçûk yên li Kurdîstan û Tirkiyeyê ku her çikas zewîcandina bûkên biçûk di nava normal were ditin ji di rastiya xwe de îstîsmariya zayendiyê. Zewincandina zaroka ya di temenê biçûk de, li Kurdistan û Tirkiyeyê, pisgirêka civakî ya herî sereke ye. Li Kurdistanê gelek zarokên ku temên wan di navbera 16-17'an de ji aliyê malbatên xwe ve bi zorê tên zewîcandin û ev jî li ser van dibe sedema pirsgîrekên derûnî. Li gelek heremên Kurdistanê zewîcandinên zarokên biçûk-(Bûkên biçûk) wek kevneşopiyek ango çande tê ditin û di her malek de bûkeke biçuk heye. Li gorî rapora Lêkolina Saziyan û Statîskên Tirkiyê ya fermî de li Tirkiyeyê û Kurdistanê herî kêm 181 hezar bûkên biçûk hene û bi tenduristiya derûniyê re rû bi rû ne.

Zarok di nava zewacê de mezin dibin

Pijîşkên derûnî ku mijara zarokên di temenê biçûk de tên zewicandin dinerxînin, diyar e ku ev rewş li ser derûniya van zarokan zirarên mezin pêk tîne. destnîşan dikin ku ev zewaç her çiqas di nava civakê de wekî zewacekî asayî were dîtin ji rastiya wê îstimara zayendî ye.

Pijîşk dibêjin" Li Tirkiyê û Kurdistanê hejmara bûkên biçuk gelek in û ev jî wek rewşeke ji rêzê tê ditin. Zarokên ku di temenê xwe yê biçûk de bi taybetî jî zarokên jî alî derûniyê ve di kevîn nava xitmandinekî de. Zewaca kesên ku ji hêla fîzîkî, derûnî û hestiyariyê ve nû bi nû têdigehêje û dikeve nava nasnameya xwe ya zayendiyê ya di temên biçûk de tesîrek neyînî ya neveger li ser wan derdixe holê. Di vê demê de zarok hêj xwe û bedena xwe nas nake. Xwe di nava giraniya zewacê de dibine. Giraniya zewacê ew qas giring e ku miroveke mezin jî zû bi zû nikare ji bin giraniya we rabe. Di rewşekî wiha de zarokekî/ê biçûk çawa dê vê berpisyariyê rake? Ji ber vê yekê jî zewîcandina bêhişmendi rê ji nexweşahiya derûniyê re vedike."

Xwekuştina jinan giraniya zewcandinê ye!

Pijîşkê derûnî Ozlem Tolan di berdewamê de têkildarî xwekuştinên jinan de ji hin agahî dan û anî ziman ku sedema xwekuştinên jinan ya herî mezin; zewaca di temenê biçûk de ye. Herweha got: "Li ser vê mijarê gelek lêkolin û xabatên me hatin kirin. Di encamê de hat tespînkirin ku dema zarok di emrê xwe yê biçûk de hatin zewîcandin; rastî pisgirekên wek deprosyon, somatîsazyon û eşên ku sedema wan neyên zanebûn dertên pêşberî wan."

Derûniya wan dixitime

Pijîşk dibêjin ku piştî vê zewacê deruniyazarokandixitime.Dema ku em li ser vê mîjarê diaxîvin, tevzîneyek tê ser bedena me. Em difikirin, gelo zarokeke ku hêj ew mezin nebûye çawa dibe xwedî zarok û zarok mezin dike. Em matmayî dîmînin. Keseke ku ne gîhîştibe asta zanabûnê tê çawa zarokek bihîşmendî mezin bike. Di malzaroka xwe ya biçûk de zarokek wek xwe mezin dike û bîne dinê."

Zarokên van zarokan

Pijîşk dibêjin Ji hêla pijîşkî ve jî baş tê zanîn ku dema ku dayik ji hêla hîşmendiyê û fîzîkê ve bikêmahî be, zarokên ku tên dinê jî bikêmahî ne. Ev çanda ku di nava civakê de ye ji bo jinan pir zahmet e, bila baş were zanin ku hiqûqê de mafê tu kes tune ku jiyana jinekê re bibe astengkirin."

Yek sedema van zewcandinê jî aboriye

Pijîşkê derûnî Tolan dibêje ku zarokên ku tên zewîcandin, zarokatiya wan ji deste wan tê dizîn û jiyana jinan tê tesbîtkirin û diyar dike: "Bi vê zihniyetê, tevgera jiyana jinê tê astenkirin û her wiha jin bivê yekê di nava çarçoveyeke din jiyandin ji bo pêşketina jinê ev nêzîkayî şaş e. Bi dahan sedemên zewîcandinên di temenê biçûk de hene. Em dikarin wekî sedemekî sereke bêjin ku yek sedema vê jî aborî ye. Gelek malbat keçên xwe wek riya dabariyê jî dibinin û ji bo qelenên wan tên zewîcandin yanî dibin navê qelen de jin tên firotin."

Divê xebat werin meşandin

Derûn-nas destnîşan dikin ku sedema ku zarokên di temenê biçûk de tên zewîcandin ew e ku bênezaniya civakê ye. Bi taybetî di herema me de ev pisgirek pir ciddî ye. Ger ev pirsgirek niha were çareserkirin û xebaten mezin werin meşandin. Her wiha civak li hember vê zihniyetê werin perwerdekirin û hînkirin."

(lg)

Enwer Cemîl

Zimanê Dayikê

Ebdulhekîm Ehmed Mihemed

Roja 21 ê vê mehê helkefta Roja Cîhanî a Zimanê Dayikê (zikmakî) ye, ev roja ku me ew paşguh kiribû ji berê de, lê ev bû çend sal bi rengekî qels em wê bibîr tênin, ne tenê em wek gelê Kurd, lê gelek miletên cîhanê jî ew bibîr nedianîn, çiqas xweş e ku em vê rojê vejînin û a herî jê xweştir ew e ku em serê xwe bi zimanê xwe bilind bikin, ev zimanê ku bi hezarên salan li ber xwe daye, û em serê xwe bi xwe bilind bikin wek gelê Kurd ku me karîbû vî zimanî biparêzin bi bihûrîna dem û serdeman re ji stemkarî, bindestî, dagîrkirin û diktatorên ku li ser me bi hemî rengan dixwestin me têk bibin, û vî zimanî ker bikin û hîn jî ev kiryar berdewam in ji erebkirin, turkirin û furiskirina ziman.

Zimanê me bi nazikbûn, xweşbûn û hêsanîbûnê ciyawaz e, bingeha xwe parastiye bi ser ku em wek gelê Kurd ji sedên salan ve belawela ne û hîn jî em bi rastî li ser babeta ziman ne rawestiyane, ku ne komeleyeke zimanî rast û durust heye da yekrêzî û wekheviyek tê de ji zarav, gotin, bêje, rave, rawe, wate û rêziman hebe û ne jî zanisteke zimanî (languistique), ji ber ku çand û şaristaniya her miletekî zimanê zikmakî ye, heger ew têk çû milet jî dê têk here, ev tişt dihêle ku em bi ziman û çanda xwe ve bên girêdan da ku ev têkilî di navbera ziman û kelepûrê jîngehî ê ku ev ziman tê de ava bûye çêbibe, parastina çandê parastina ziman tekez dike, û naskirina çi zimanî bê ew e naskirina şaristanî û çanda miletekî, xweş e ku em zimanine din nas bikin an ku fêr bibin, lê bi marcê xwegirêdana zimanê dayikê berî her tiştî û ne piştguhkirina wî weke ku gelek miletan weha kir û ew ji koka xwe de windabûn, bi têkçûna zimanê xwe ew jî têk çûn, ne milet, ne ziman û ne jî şaristanî, mixabin.

Li gorî raporteke Rêxistina Yûnisko, da xuyakirin ku di cîhanê de 6800 zimanên cuda hene, ewê rêxistinê metirsiya xwe ji têkçûna zimanên zikmakî diyar kir, ji ber ku têkçûna her zimanekî ew e têkçûna şaristaniyekê bi tevahî û ev tişt binketineke ji hemî mirovatiyê re, di heman demê de rêxistinê diyar kir ku piştî du sed salî, ji sê sed zimanî pê ve namêne ji wan 6800 zimanên heyî di dema niha de, lewma ev rêxistin giringiyê dide parastina ne tenê zimanê dayikê belê hemî zimanan jî.

Her zimanek bi van tiştan geş dibe û bi hêz dibe di nav zimanê cîhanê de; 1- jimara kesên ku pê daxivin. 2- cih û geşiya wî di malper û rûpelên internêtê de. 3- wergerandinên ku di vî zimanî de pêk hatine. 4-jimara welatên ku vî zimanî pêk tênin bi rengekî fermî. 5- filim, mozîk û pirtûkên ku bi vî zimanî hatine nivîsandin û belavkirin. 6- pirtûkên rêzimanî ên taybet bi vî zimanî.

Rastî gelek ji van li ba me hene û em karin li ser wan rawestin û bi rengekî rast û tekez van pêk bênin.

Zimanê me ketiye pileyeke bilind de ji rêza zimanên cîhanî, giring e em bihtir lê xwedî derkevin, û hewla avakirina komeleyek an jî navendek giştî vekin ji bo parastina wî û pêkanîna yekîtiyekê di navbera hemî zarav û raveyên Kurdî de di herçar parçên Kurdistanê de, belê di hemî deverên ku Kurd tê de hene weke Kurdistana sor û Ewropa ku niha gelek Kurd tê de dijîn, her rûpelek bi zimanê Kurdî cihê wê û bandora wê li cîhanê û li Kurdistanê bi tevahî heye, miletê ku zimanê xwe parastiye ji hezrê salan ve bi ser hemî astengiyan de, bi hêsanî karê cihê zimanê xwe di cîhanê de çêke û şanazî û rêzgirtina wî di nav zimanê cîhanê de ava bike, de em bi hev re hewla pêşketina vî zimanî bikin û vê rojê jibîr nekin.

Ziman û Avakirina Kesayetî

Azad Oso

Ziman weke hestiyên piştê (movikê) ye, rola sereke û bingehîn ya liv û tevgerî dilîze, mirov bê wî pûç, bê liv û tevger digere û dijî, di derûniyeke westiyayî ,kesayeteke kêmayî de bi keser dûrî civak û dîtina rengê jiyanê dijî.

Eynî ziman ewê ku netewan ji hev cûda dike û wan bi hev dide nasîn, çand di riya ziman re tên parastin û şaristaniya gelan pê tê nasîn.

Zimanê Kurdî û perwerdekirina zarokên kurdan bi zimanên beyanî çi kesayetiyê ava dike?

Zarokê kurdan piştî parçekinin û dagirkirina welatê wan ji mafê xwe yê yasayî, xwedewerî ew e ku bi zimanê ku xweda pê ew daye bê par û mehrûm mane ,bi zimanê beyanî hatine hînkirin û perwedekirin .

Vaye dagirkerên Kurdistan bi zanîst pêk anîne û zimanê wan weke zimanê cêwîlegî daye nasîn, li hember vê zimanê xwe kiriye zimanê fermî.

Di riya vê yekê re xwestine ku çand, netewa Kurda tezyîf û îmha bibe, kesayeteke Tirk, Ereb û Faris were avakirin.

Vê roleke pir mezin lîstiye, hiştiye ku zarokên Kurd bi dudilî mezin bibin hin caran gihiştiye asta ku ew xwe kêm û bibîne û dûrî rewşnbîriyê bijî.

tevahî lêkolînên ku hatine çêkirin û yasayên navnetewî, ragihandina parastina mafên zarokan vî mafî tekez dikin lê gelê kurd bi salan xwe bêdeng kiriye, dagirkerên wan jî bo tinekirina wî kar û xebatên mezin kirine, encam jî bi dest xistiye, gelekan ji kurdên Bakur, Başûr, Rojhilat û Rojava dev ji kurdetiye xwe berdane û dagirkerên xwe pirtir diparêzin.

lêkolîna Emrîkî ya dawî li ser hînkirin û perwerdekirina zarokan bi zimanê beyanî wiha dibêje: Zarokên bi zimanê beyanî tê hînkirin û perwerdekirin kêm jîr in ,şîreta wan jî ewe ku divê zarok bi zimanê dayîkî bêne hînkirin ji ber ku ew bingeha avakirina kesayetiya rasteqîn e.

ne tenê ew wiha dibêjin gelek zanyarên din jî ev yek di teoriyên xwe de tekez kirine.

Jean Bioget: Di teoriya xwe de wiha diyar kiriye qonaxa yekemîn ya zanîstî rola sereke û pir girîng di avakirina kesayetî, mêjî de daye ziman .Tê wateya ku zarok bi çi zimanî bê hînkirin û perwedekirin bi wî zimanî mezin dibe.

Bruner jî vê yekê tekez dike û dibêje: Hizir û ramanê weke zimanekî hûndirîn nîşan dide, pêşveçûna fikrî û ramanî bi ziman ve girê dide.

Gelo divê gelê kurd bi çi karî rabe da ku ji kesayetiya zeîfkirî, hirfandî xilas bibin?

Divê em weke gelî kurd xwedî felsefe, çand, ziman xwe bidin nasîn û kesayeta resen ya kurdî ji nû ve bidin avakirin.

û tevahî gelê kurd divê xwedî vî barî be, li ser milê xwe bigre û dest bi hînkirin û perwedekirina zarokên xwe bi zimanê kurdî bike .

ev yek nayê wateya ku tu zarokên xwe fêrî tu zimanê beyanî nekî. lê divê zarok bi zimanê xwe hîn û mezin bibin .

da ku ji çanda tezyîfkirî rêzgar bibin, ji ber ku rêzgariya çandê rêzgariya welat e. heta ku em weke gel xwedî taybetî werin naskirin divê em xwe çanda beyanî xilas bikin

Tabloyek Ji Êşa Zarokek Kobanî

Cîhan Hesen

Wek her carê ji nişkan ve kela bêrîkirina wê berxwedanê li bîra min ket û dest avêt qirika min, ku derneketama û xwe ji agirê vê bêrîkirinê xelas nekira ez ê di bin dûmana bîranînan de bifetisiyama, diviyabû ku min xwe radestî wê bêrîkirinê bikira û ji malê derkevetama. Ji bo wê berêvara wê rojê min boxçeya xwe ya tijî ken, girî, lilî û şehadet da ser milê xwe. Ber bi taxên berxwedanê ve çûm, bayekî qebe dihat rûyê mirov dilerizand, lê di kolanên janê de rûyê min bi bayê Xwedê hîsnedikir, ji ber ku bayê êşa vî bajarî rûyê min bist bi bist diterikand.

Li her kolaneke rêzedîmen di ber çavên min re diçûn û dihatin, di her taxekê de sed şehîdî ez pêşwaz dikirim. Him bi wan re dikeniyam him digiriyam û him jî li wan temaşe dikir û diketim xeyalan ku çawa şervan li ber çavên min bang dikir û digotin: Bijî Berxwedana Kobanê.

Kêlî bi kêlî xwe li dilê min dipêçandin, heta ku bi suhbeta wan êşan re min xwe gihand taxa Sînae, li wir min tev bi dengê stranên şervanan re winda kir. Her tişt wek kurtefilmekê li ber çavên min re derbas bû, gava ku şervanan ew tax ji destê dijimin rizgar kirin û li dengê wan semaya Kobanê dengveda, lê zarokekî biçûk ez ji wan bîranînan derxistim, gava ku min dît ew li taxekek hilweşiyayî û li alî rêkê, di nav bermahiyên şer de maseyeke biçûk daniye û cixareyan difroşe. Hewil dide ku agir pêxe, ji bo ku xwe ji seqma sermayê biparêze, lê nedizanî bû ku agir pêxista beriya ez xwe bighînim wî, agir gur bû û bi şaşetî xwe li bedena wî hilperikand. Min bi lez xwe gihande wî ew dûrî agir xist û jê pirsî ka bedena te tiştek bû ye yan na, lê wî got: Na spas ez baş im. Pişt re ez hinekî bi wî re sekînim û min got navê te çî ye ?

Got: Navê min. Şoreş e.

Û min got baş e şoreş çima tu li vir cixareyan difiroşî û tu hîn biçûk ji bo kar, hîna ev der tijî bermahiyên şer in. Got: Ez yê mezin di malbatê de me mecbûrim ji bo malbatê kar bikim, ya din jî hemî deverên Kobanê bermahiyên şer in ma ez li kur bifiroşim.

Min gotê : Erê qurban bes ku tu tiştek bibî wê malbata te çibike xwe biparêze, ji bo xwe û ji bo wan û careke din bila bavê te yan kesekî din were ji te re agir pêx tu hîn nizanî pêxî tu yê xwe bişewitînî. Li min bi çavên tijî girî vegerand û got: Ji xwe ez hatim cem bavê xwe, bavê min li vir e, li vir jî şehîd ket, ez hatim cem wî ji bo ku ji min re agir pêxe, bibîne ez mezin dibime û malbatê li pişt wî xwedî dikim, lê va bû saleke ez li vir im bavê min ne agir ji min re pêxist û ne jî ji min got bijî kurê min tu mezin bûye.

Wê kêliyê min sed carî xwe kuşt, ji xwe nefret kir, min bêdengî kir para axaftinên bêsûd û bi heyecana lêborînê we hembêz kir û min got: Şehîd Namirin. Lê min jibîr kir ku beriya ez bi wî zarokî re biaxvim sed carî li çavên wî binêrim û fêm bikim ku êşa şehadetê di çavan de diçirûse.. Erê.....Bersiva hemî Pirsên şoreşê di çavên zarokên Kobanê de ye.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestin Bijartî .. Gulal Kasanî

navê wî di nasnameyê de Telal Hesen Husên e, navê Gulal ne hat pejrandin ji ber ku navên Kurdî di wê demê de qedexe bûn, ji malbata Beglîxanê ye, ew jî ji malbatên herî kevnar e, li Sinceqa Xelefê Axa ye, ya bi ser herêma Terbespiyê ve ye. Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyê ye

AZADÎ

Vînek ji kefçika dil e
arîyanek jê dibişire, dibirise..
av daye, hêza canê pakrewan
perdeke rengîn, alandî ser mil
xelat kir bûkeke bi bejin û bala..
azadî..
bi dergihê sor, bihişta siwara..
bergeha bê ware, çareya bê mara..
erê..
di dil de şiyar e
komireke pereng e, ar e…
dikele, bi badana zevleka
na vemire, gel xilmaşa nêçîrvana
hev disincirînin pizot
tîn didin..
revîn didin..
li kotek bigef in..
xûn e, vejîn e
kulîlkan ji bin latan hiltîne
dilîlîne..
bi qoş û bezza şeyên resen ..
deman dihêre.. dikudîne
azad î…
ber û oxirê
piştê dide felekê..
Ji taristaniyê
roniyê diafirîne
azad î….azad îîîîîîîîîîîîîîîîî...

Xewneke Seqemî

Xewneke Seqemî
di baweriyan de bû
di arîna hêviyan de bû
spîndarek bi agravê re dijî
wêrekan…?
bihêrzeke lawaz
di naveroka xewnê de
hêlînek ji awiran avakiribûn
bi agravê..
Serê tîran.. Dişiştin
Li bin sîwana dara diriyan
Li benda nêçîreke sergêjekî
…..diman
Lê……
Aso ewrin giran…giran
..Diyarkirin
Niyaz bi bînefeşkê
Li dû wan dikulkulî
Cerdevanan lotik dan..
Zam dan zixtê
Dilsozan….birîn pêçan
Bi tîna biratiyê
Di hembêza dayikê de
……Vehêsandin
Agir gûr şandan……
Çek hildan..
Ronî û şewat bûn bira
Zanbor mane lîs.
Bayê kur mitêl e
Balgeh kevir e
Şevên reş…….tarî
Awazeke strayî….
Bi hevîrtirşekî zuha
Xewn di hestên wan de
Bû giroveke paldayî
…ji arê pîroz
Kedxwer di çavê xwe de
……Radikirin
Ciwanîk û xweşmêr
Di şevînê de bendewar in
Di jêrzemîn û xeşîmeyan de
Hûçik vedmalandin
Gulî dihûnan
Pî û pêngav dihejmartin
Dipîvan…….
Merdan bi şeqepêlî
Li taristaniyê…hovîtiyê, li koletiyê
Gef xwarin
Hêvî û xwezî terr vebûn
Mirov gernijî
Pişt rast ma
Rastî bû bersiv
Serast dibin çiv
Xewna qerimî
Şabaş û ohyan
Li serpêsîra dayikê
Pakrawan nivist
Man şadî û geş
Çi xewneke xweş…??

Di sala 1968an de li gundê Sogiya jidayik bûye, li wir xwendina xwe ya seretayî sergihayî kiriye, xwendina navendî li bajarokê Tirbespiyê berdewam kiriye, piştre li Şamê Amojgeha Xezil xwendiye û bawername bi dest xistiye, paşê li zanîngeha Helebê beşê Huqûq –xwend, lê di sala dawî de û ji ber rewşa ewlekarî xwe veguhest Zanîngeha Furat ji wir bawername bi dest xistiye.

GER TU LI NIK MIN Bî

Ger tu li nik min bî
Hêviyê evîna xwe
bi teşiyên mijgûlên reş
dirêsim.
Ger tu li nik min bî
serperîkên dilê xwe yên şikestî..
koşek ji efsana lehngên evînê..
aza dikim.
Ger tu li nik min mbî
Pêlên dastna Mem û Zînê
min didaqurtînin
û..li parava siruştiyê
min sêwî-tazî tamar,û talankirî dihêlin.
Ger tu li nik min bî
esîman wateyek..belek
ji çavên te reng-reng digire
çivîkên evîna min tê de diyar dibin…

Sibat

Sibatek lal
naverokek..avdizî
canê xweşmêran..qurban dan
bi yarmetiya metirsiyê..
arama hêviyan dixwest
biqelişîne
dilopên xwînê
yekeyek
jê tên xwar
lehiyek ji merdan
şeqepêl dike
qulzemek fermîskên ..
hawargihana..zarokên bê himbêz
di keftlefta pêljanên xwe de
winda dibe
rûçkên saloxan
bi kuldarî..xwe dixapînin
ken didin
bi hêvîdariya levhatinek daxdayî
lêvên qurmizî, xunav didan
darek pelweşên
di sibatek lalî bihin teng de
xwazgînên xwe
bi sirrek seqemî
lotkên wan, dorpêç dike
şermezariya xwe
di bin konekî bê stun de
vedişêre
ah û ohiyanên xwe
bi hev re tuj dike
pê ciwaniya xwe
kurkur dike
avjîna xwe, girr lihev dixe
lê….
Tînên şehsiwaran..hişmendan..
tên hev ..lihev vedgerin
mîna pêtên arên sor.. hilordidin
qelzemek ar didin
xwenas, xweza, merdane, canpolayî…
armancnas in.
Nalivim
Ger sosin di xulpelêlan bivejin
Xunav ji teht û latan ew birijin
Kevir giran im şûnwaran naleqim
Ku mar û dêwên "Daiş" bi helkefin
Li xure cihan hindek bi serkefin
Zik zemîn der im
zê wan de biteqim
Ku çiya û gerdûn bo min bihejin
Zuxur pola ser mûmê biherijin
Awir piling im, arzû xwe naliv
Tan û topên wan ser min biherikin
Ji çar kenar sîxuran ber bi rêkin
Dar û devî me ji qurm hilna bim
Heger kanî û çîmen ber min dagirin
Co û cobaran ji kok xakê bibirin
Lat û hîman bi kulman dê guvêşim
awzek û du stranan we re rêjim
Qawanek du pel li Qamişlo rêsim

BERXWEDANA LI ŞENGALÊ

Peywer im her bo xaka welat
kim sinciyê, karê rager
soseretî xweda sirûş da felat
jê dizêtî bîr û bawer
can ve xûzekim ber xak û zemîn
xûzekim, ney kes û serwer
min ji hev veb çiran, tevna sohîn
min şikan pêç, merc û kember
pêç û merce, û zinara şofîn
azakim xakê , gil û der
haraya bi fêz û gûr, vîn hespîn
mijdabî xortên dilawer
ên pêkin, ew ceng û hala gerîn
şervan in, meyz va ketin şer
hêzeya li şengal in dij tewîn
dê kin şer, hev deste rêzger
îrema Zeredeşt in roj zemîn
laleşa pîroz e pêger
cengevan vehilistin ser piyan
milmlia gel hev bidin der
wê qelêşin hîm û latên çiyan
wa rengî reşa bikin der
rojereş hilan, jev-jev diriyan
tên bi him-him weke bager
rojegeş şageşîn e, vehilbû
ha ji Şengal agirê şer
şingeşinga şûr û tîr e gurbû
leşkerê ser hespa qemer
wê leheng dest û stiwê we badî
afsana dêrîn min jê der
va ji Hewlêrê pijqîme cardî
pêşmergên kelmend û perwer
meyzekin, kurdo gerdûn hejandî
va rengîn al ro pijqî ser
rabe millet hev bêjin re bêjin
yan Kurdistan da hewkin şer

PERWÎN…

ez evîndarê perî dihê salan
dil şikestî reben bê hedan
avjenîm di kendava
gerden û lêvan
çav nehêrî..mam bi hêvî..
lûb-lûb lê kir..min
çavê perî..
dilovan be, bide min parek.
perwîn.. wa gulperî
her nerînek te..
bi fêrmûskan..
kedîkiribû..
her mûmek di tenahiya min de
vêxistîbû..
te vemirandibû..
her warek bi yek carek

te hişt..
bê xwedî
bê çarek..
her dîlanek.. di can de..
te kirbû..havînek..
min dixwest bi van..nerînan te evînkim
lê…
bi wan derdan, te ez dîl kirim perwîn
tu dixwazî vemrînî..çira dila..?
ez berê kor im..ji sawîra te pêv..
nabînim
çilo ez ê herim..di xaçerêkên
reşevan de..te himbêz bikim
em ê bigihên hev
heger ne li vir..li wir
ne li gerdûnê..li asîman
ne li vê jînê..
belê .. piştî mirinê.
li jorê banî ..ba Xwedê
da ku mehra me bibire..
belkî, evîndarî..
min bike mirovek..
dilovan..
dilovanekî
dil şikestî..
pişt tewyayî..
belkî evîndarî, çêke ji min
nêçîrvanekî wenda
bê amanc..
yan lehengekî destanî
biçirîne..sînoran..
rizgar bike Edûlê
bişkîne latê çiyan..
da biçespîne..qelenê şêrîn
tu evîna min î..
tu jiyana min î
çima tu dixwazî
bîra evîna min biçkînî..?
min bike dilyarekî gerhok
û koçerekî bê kon
yan..lewendekî evîndar…
û…şermok

Nivîsandin:
a-Xwendin û vekolîneke dîrokî di kok û hebûna kurdan , li Rojavayê Kurdistanê de (lêkolîn bi zimanê Erebî).
b-Azadî (Helbest) helbestên nûjen-bi zimanêKurdî- çapkiriye.
Pêşgotin Seydayê navdar helbestvanê gewre Memûd Sebrî. Wêne, şêwekar mamoste Emmar mûsa.
c-Rola Turkan di kêşeya kurdî de (lêkolîn).

GER EZ HATIM BÎRA TE..

Eger ez hatim bîra te ..
bi wan çavên xemgîn..
min dorpêç bike..
di hişê xwe de ..
min dayîn bike
bi wan çavên şêrîn ..
min evîn bike
hêwa .. hêviya ji mirre sînoran b'arke
wîneyên .. min li tenahiya şiyar bike
lîstikên zarotiya di dav û fitrake
bê dudilî ..
wan nêçîrke
bi şalê bedewiya xwe ..
li dor çavan winda bike
* * *
Evîna min..
heger şahiya kir dîlan
rondikan bibarîne
da xemgînî ji reşçavan..
bibin perwan..
da xelatkin..xemla rûçkan
bibirisin..ew dev û diran
bihejin.. ew mijgûl û lêvan

Yara min ...

Eniya te Laleş e
çavê te kevirê reş e
birhên te heyvek li şeva reş e
bejna te.. dawetek serxweş e
bîna te.. buharek gulgeş e

Yara min

heger ez mirim, fermîskan nebarîne
bi ben û bendan ...
wan zindanke
gorineke min çêke..li gir û kendalan
belê..li dûriyan
li bêlana bê av ..û jiyan
ne li newal û deştan
ne li zemînek bê kevir û latan
li asîmanek bê heyv û stêran
…li toza kadizan
û…
her sal li bîst û çarê meha dehem
destê xwe ..hilda ..û neda min xatiran
da canê min bimîne li her kolan û şaran
van risitan bik, turê pîran..
da bike çîrok û stran
dest ji detsan bigirin..
û ji hev re bikin yade
û li rûplên nejbîr û nemiran..
mîna Siyamendo..qurbanê..Xecê.

VÎNA KELMEND

Vîna polatî ji hesin, zihneya mafê gelan e
Kelmend nûber, ji kerbê welat, cerg û dil pê kewane
Merd im bê ser, ji qencewar im, lê ber û niv xemdane
Mij mêjû warî kûreder im, bedew xakî xemlane
Aza ji zatê azarê,vîn ji helista peyan e
Dil pey yar cergan disoje, xal dêman ser rû miçane
Ê bê welat, tazî û rût, yan kincin xilmet dimane
Bi sînor û tixûb, dadan li min hesar ew zindane
Gelek payedar in em, di dîrokê de rih berdane
Kak û ka ji bo maf nake çare ji bo me Kurdan e
Ger xûn li ser kuh û latan ne bit wek gol û bestan e
gul çîçek li hawîr venabit li mêrg û deştan e